

## **Agahî li ser barkirina dibistana Gottsunda (Gottsundaskolan) li destpêka hefteya ku bê.**

Van rojên dawî û paş dibistana Gottsunda agir bi temamî girtî û şewitî, şaredariyê biryarên curbicur li ser xwendekar û karmendên dibistanê dan, ka çawa û li çi dibistanan xwendekar karibin dersên xwe bixwînin.

Em dibînin giring e ku xwendekar bi zûtirîn dem carek din dest bi dersan bikin, û mamoste dest bi karên xwe bikin. Ji ber ku dibistan cihê fêrbûna rastî û misogerkirina jiyana û paşeroja xwendekaran e.

Di vê çarçoveya rênîşandan û avahiyên di jiyana rojane ya xwendekaran de roleke girîng dikin.

Îro sibehê de 11ê Octoberê, berpirseya perwerdê Birgitte Pettersson biryar da ku hejmarek ji xwendekarên ta sinifa sêyan, rojane li dibistana Sverker ya seretayî li Götgatan dersên xwe wergirin. Xwendekarên din (rojane ta 100 xwendekaran) li dibistana Tiunda (Tiundaskolan). Cihên din wek cihên (sporê, xwaringehê, û cihên din) li Gottsunda de dersan wergirin, da ku bingehê ji bo xwendekarên me li wê deverê bimîne.

Ev biryare hate dan, ji bu sinifa û dersên wan ji hevcuda nekin.

Her wesa Otubusên dibistanê amadene (hazirin) ku xwandekaran ji navbera dibistana Gottsuna bibin cihên wan yê xwendinê.

Herwesa li hevhatine ji bu dîtina cihên baş ji bu xwendekaran û bi zûtirîn dem li Gottsunda. Cihên ku gişt bi hev re bin, ta ku dibistana nû li Gottsunda avedan bibe.

Li ser biryara me ya îro, em niha bi karê û planên xwe yê praktîk radibin, ji otubusên dibistannê bigir ta xwarina xwendekaran. Her wesa çêkirina şemaya xwendinê û fêrkirina xwendekaran amade dikin.

Em bînferehiyê ji we dixazin eger her tiştek drûst nebu wek me dixwast ta roja duşemê.

Sibe roja îne em ê agahiyên herî dawî ji we re bêjin, pêş roja duşemê.

Em spasiya we dikin ji bu bînferehiyê, dilsoziyê, piştgrîyê, alikariyê û ji bu têgehiştina we nîşanê me kir. Em ê xebatê bikin û berdewam bin ji bu karkirina bi hev re.